

Deng dan

Hilbijartin 9 îlon 2018.

Di hilbijartina ji bo parlamento
û meclîsên belediye û wîlayetê
tu weha dengî didî.



Kî dengî dide?

Ji bo hebûna mafê dengdanê, divê te herî dereng di roja hilbijartinê de 18 sal
temam kiribin. Agahdariyên ku 30 rojan berî roja hilbijartinê di qeyda nifûsê de
hene mafê te yê dengdanê û taxa te ya hilbijartinê teyîn dikin.

Mafê te yê dengdanê ji bo parlamentoyê heye heger tu:

- welatîyê Swêdê bî û di nifûsa Swêdê de qeydkirî bî yan hatibûyî qeyd kirin.

Mafê te yê dengdanê ji bo meclîsên belediye û wîlayetê heye heger tu:

- welatîyê Swêdê bî û di nifûsa Swêdê de qeydkirî bî
- welatîyê welatekê ku di Yekîtiya Ewropayê de endam e bî yan welatîyê Îslanda
yan Norwecê bî û di nifûsa Swêdê de qeydkirî bî
- welatîyê welatekê din bî û berî roja hilbijartinê sê salan li ser hev di nifûsa Swêdê
de qeydkirî bî.

Mafê te yê dengdanê hebe, tu karta hilbijêran werdigirî

Tu yê ku mafê dengdanê heye karteka hilbijêran sê hefteyan berî hilbijartinê bi
rêya postê werdigirî. Ka mafê te yê dengdanê ji bo kîjan hilbijartinê heye, nav,
navnîşan û demên vekirî yê lokalê te ya hilbijartinê li ser karta hilbijêran hene.
Agahdarî li ser lokalên ji bo dengdana pêşdem jî li ser karta hilbijêran hene.
Heger tu dê pêşwext dengî bidî, divê tu karta xwe ya hilbijêran bi xwe re bînî.

Heger te karta xwe ya hilbijêran wernegirtibe yan wenda kiribe, tu dikarî yeka nû
ji belediyeyê yan Daîreya Hilbijartinê bixwazî.

Karta hilbijartinê

Kartên hilbijartinê ji bo hilbijartina parlamentoyê zer, ji bo hilbijartina meclîsa
belediyeyê spî û ji bo hilbijartina meclîsa wîlayetê şîn in. Kartên hilbijartinê li
hemû cihên ku lê dikarî dengî bidî û li ba partîyan hene. Heger tu pêşwext yan bi
rêya wekilî dengî bidî, mimkin e hewce be ku tu kartên hilbijartinê ji partîyan yan
belediyeyê bixwazî yan bînî.

Dengî bide partîyê

Tu dengî berî hertiştî didî partîyekê. Navê partîyê li ser karta hilbijartinê heye.
Heger tu karta hilbijartinê ya partîya xwe peyda nekî, tu dikarî karteka hilbijartinê
ya vala hildî û navê partîyê çî qas dikarî zelal li ser binivîsî.

Dengî bide kesan

Heger tu bixwazî ku kesekê taybetî ji namzedên partîyê bê hilbijartin, tu
dikarî dengdana ji bo kesekî bidî wî kesî bi rêya ku xaçekê di çargoşeya
li ber navê namzedî de li ser karta hilbijartinê danî. Tu dikarî
xaçê li ber navê namzedekî tenê danî.



Divê tu nîşan bidî ku tu tu yî

Divê tu bikarî nasnameya xwe - bi rêya nîşandana belgeyeka nasnameyê, wek karta ajotînê yan pasportê - îsbat bikî da ku bikarî dengî bidî. Heger te hîç belgeya nasnameyê nebe, kesekê din dikare nasnameya te îsbat bike, lê hingê divê ew kes belgeyeka nasnameyê nîşan bide.

Dengdan

Di roja hilbijartinê de li lokala xwe ye hilbijartinê dengî bide

Tu dikarî tenê li wê lokala hilbijartinê ya ku li ser karta te ya hilbijêran heye dengî bidî. Lokala hilbijartinê tenê di roja hilbijartinê de vekirî ye. Dema tu li lokala xwe ya hilbijartinê dengî didî, tu ji listeya hilbijêran têyî avêtin û dengên te di sindoqên hilbijartinê de tên xistin.

Li belediyeya xwe yan yeka din pêşwext dengî bide

Dengdana pêşwext ew e ku tu ji bilî lokala xwe ya hilbijartinê li cihekê din dengî bidî. Dengdana pêşwext teqrîben sê hefteyan berî roja hilbijartinê dest pê dike û heta roja hilbijartinê dewam dike.

Divê karta te ya hilbijêran bi te re be gava tu pêşwext dengî didî çunkî ew ji bo şandina dengê te bo lokala te ya hilbijartinê tê bi kar înan. Dengê te li wê derê tê hejmartin.

Tu dikarî agahdariyê li ser ka tu dikarî li kûderê pêşwext dengî bidî ji www.val.se yan ji belediyeya xwe werbigirî.

Ji derveyî welatî dengî bide

Heger tu li derveyî welatî bî, tu dikarî bi rêya nameyê dengî bidî yan li gelek balyozxane û konsolxaneyên Swêdê dengî bidî. Ji bo dengdana bi rêya nameyê, pêwîstiya te bi malzemeya ku tu ji Daîreya Hilbijartinê dixwazî heye. Tu dikarî herî zû 45 rojan berî roja hilbijartinê dengî bi rêya nameyê bidî û 24 rojan berî roja hilbijartinê li balyozxane û konsolxaneyan dengî bidî.

Hin dikarin bi rêya wekîlî dengî bidin

Tu dikarî bi rêya wekîlî dengî bidî heger ji ber pîrî nexweşî yan seqetiyê nikarî bi xwe biçî lokala xwe ya hilbijartinê yan lokaleka dengdanê. Hingî mêrê te yan jina te yan hevjinê/a te yan zarok, nevî, dêûbav yan xwişk û birayên mêrê te yan jina te yan hevjinê/a te dikarin bibin wekîl. Kesê ku wek pişe yan bi awayekê wisa te îlac dike yan adeten alîkarîya te dike jî dikare bibe wekîl. Herweha, tu dikarî bi rêya wekîlî dengî bidî heger tu di tewqîfxaneyê yan girtîxaneyan tawankaran de girtî bî. Hingî karmend jî dikarin alîkarîya te bikin. Heger tu li ser xeteka posteçiyê gundan bî, posteçiyê gundan dikare bibe wekîlê te. Heger tu kesî yê ku karibe bibe wekîlê te nas nekî, belediyeya te dikare kesekî bişîne mala te da dengê te werbigire. Têkilîyê bi belediyeya xwe re bike. Ji bo dengdana bi rêya wekîlî, pêwîstiya te bi malzemeya taybetî ya ku tu ji belediyeyê yan Daîreya Hilbijartinê dixwazî heye.